

Payê Şêx Marûfê Nodê di Edebiyate Klasîke kurdî de

فەنەر رۆژیانی/ Fener Rojbiyani

fenerroj@hotmail.com

Lîsans Hiqûq Zankoya Heleb.

Twêjer û Lêkolîner di warê Edebiyate Klasîk

Ji Rojavaya Kurdistanê û ji sala 1996an de li Almanya dijî.

ریکەوتی وەرگرتنی توێژینهوه: 2024/5/7

ریکەوتی وەرگرتنی توێژینهوه: 2024/3/1

Puxte:

Payê Şêx Marûfê Nodê di Edebiyate Klasîke kurdî de

Şêx Marûfê Nodê yê Berzencî, keseyetîyek dîyar û naskirî ye, ev zate pîroz xudî çendîn layenên Zanistî û çandî heye, ne tenê di warê zanistên ayînî de, mîna Tefsîre zanistên Quranê, jîngerîya Pêxember: ‘Eqîda û zanista Kelamê û fîqha islamî de, herwisa jî ew li pay û pileyek bilind di Edebiyate kurdî ya klasîk û bi taybetî di dîroka Ferhenga kurdî ya menzûm de.

Di evî gotarî de, ez ê hewlbidim ronahî û tîşk bavêjim li ser jiyana Şêx Marûf û bi van xalan gotare xwe Kurt dikim:

Beşe I: Şêx Marûfê Nodê kîye?

Beşe II: Cihê Şêx Marûfê Nodê di Edebiyate kurdî ya klasîk û nexasma di dîroka Ferhnege Kurdî ya menzûm de.

Beş III: Şêx Marûfê Nodê Danerê Ferhenga Lu’xatnama Ehmedî, Hekar û sedemên honadine Ferhengê.

Beş IV: Luxatnama Ehmedî ya Şêx Marûfê Nodê û Nûbihara Biçûkan ya Ehmedê Xanî, berewirdeyek biçûk di gel çendîn laperên cûda ji destnivîsên herdû Zanayên gewre Xanî û Nodê

Peyvên kilît û bijare: Şêx Marûfê Nodê, Edebiyata kurdî ya klasîk, Dîroka Ferhengên kurdî yên menzûm. Ferhenga Lûxatnama Ehmedî, Ehmedê Xanî, Ferhenga Nûbihara Biçûkan. Nimûneyên ji destxetên orijînal ya Lûxatnama û Nûbiharê.

Şêx Marûfê Nodê di dîrok û mêjuya Edebiyata kurdî ya Klasîk de

Destpêk:

Bêguman her devere li erdnîgarîya vî welat, ku bi navê kurdistanê tête binavkirin, cihê û navneda zanist û Edebiyat û Helbeste kurdî bû, ji Cizîra Botan, Şemzînan, Coleman, Miksê û Bitlîsê, Behdînanê ta Mukiryan û xakî Erdelan û Deverî Şarezor û hewramanê mezin di nav de.

Wek em dizanin ku devere Şarezor ji rojên kevin de, navek mezin ji navendên Zanist û roşinbîrî û edebiyatê bû, bajarê Silêmaniyê û navenda wê ya kevin Qele Çolan kanîya Edebiyate kurdî bû û herwisa jî dergûşa zanistî û tesewûf û îrfanê bû, di devere şarezorê û bi taybetî li silêmaniyê û derûdorê wê çendîn Medsrese û Teke û xaneqeyan hatin avakirin li ser

destên zanayên vê herêmê, medreseyên kurdî cihê perwerde û îlm û îrfanê bibû, ev Medrese û xanaqa û tekeyên herêma çendîn zana û şairên mezin bo me hênana û çêkirina.

Ne tenê zana û şêx û mela, her wisa jî weku Mîr û Xanedeyên mîrnişînên kurdî yê dîtir, her wisa jî Mîrên Mîrnişîne Baban ku bi fitre yan bi xerîzîyet mirovên edebdost û zimanhez bûn, lewra em dibînin bi destên wan mîran çendîn Medreseyan hatine avakirin, piştgirî dana Mela û Zanayên kurd ku bi erkê perwerdekirina zarokên vê miletî hildin ser milên xwe, di vî warî de ji ber giringiya dîrokî û pêwîstiya bûyerê ku ew Belgenameya Ewqafê (الوثيقة الوقفية) ya Mîr û Şazade Silêman Paşayê Baban 1765(Cemal Baban,1993,R78), (M.E.Qeredaxî,2007,R36), di ev belgename ya Weqfî ku di sala 1174 yê koçî hate nivîsandin ku têde tîne ziman hemû mal û milkê, erz û zevî dibe weqf li ser navê Medrese û Tekîyan û ji bo Şagirt û Feqeyên Medreseyên di hundir sinûre Mîrnişîne Baban de, silêmanî bibû navenda tîşkdana zanistî û roşinbîrî li tevayê kurdistanê gewre bû, bi navkirina bajarê silêmanî weku Paytexte roşinbîrî li kurdistanê ne ji valabûnê hatiya.

Silêmaniya ku cihê jidayêkbûn û derguşa bi dehan zana û Şairên mezin bû, mîna Nalî, Salim, Kurdî, Mewlana Xalid, Mehwi, Pîremêrd, Mewlewî, Bêtûşî û bêsarani, Ehmed û Tahirê Caf, Mela Abdulkerîmî Mudderis, Silêmanî zewarê Fayêq û kurê wî Şêrko bêkes, li dawî jî ev devere ku bi navê Şarezor û bajarê silêmanîyê dû kesên mezin di warê ziman û edebiyat, Fiqih û tefsîr û her warek ji warên zanistên Islamî de, yek Kaka Ehmedê Şêx bû, ya duyem jî bavê Kak Ehmedê Şêx, Şêx Marûfê Nodeyî zanayê herî mezin ne li ser asta kurdistanê lê belê li ser asta cîhana islamî bû, ku zanayê herî binavûdeng bû.

Şêx Marûfê Nodê kîye?

Gelek nivîskar û zana û lêkolera li ser jîngerî û binemala Şêx Marûf rawestîne, yek ji wan Xeyrullîn Mahmûd Al Zireklî ku di kitêbe xwe de ya bi navê (الأعلام) ku bi vî şêweyî Şêx Marûf dide niyasî (Zireklî,2002, Bergê 7, R105):

بالشيخ معروف النودهي، (محمد معروف بن مصطفى بن أحمد النودهي الشهري البرزنجي الشافعي، ويعرف وإليها نسبته. ولد في شهربازار، وتوفي وبالبرزنجي، باحث متصوف. من أهل قرية (نودي) بالسليمانية في العراق بالسليمانية. وهو من أسرة يتصل نسبها بالسيد عيسى البرزنجي الحسني).

Herwisa jî yek ji mezintrîn Zanayên kurd û zimanzanê rehmetî Şêx Mihemed Xal ku danerê kitêbe Şêx Marûfî Nodehî yê Berzencî, Şêxê Xal derbarê nav û binemala Şêx Marûf wisa nivîsandiya (Xal,1961, R69):

(هو السيد محمد الشهير بالمعروف بن السيد مصطفى بن السيد أحمد بن السيد محمد الشهير بالكبريت الأحمر، وجده الثالث العشر السيد عيسى البرزنجي ابن السيد بابا علي الهمداني).

Wek van agahî û zanyariyan ku ji destê van herdû zanayan wergirtine ku temamî navê wî ev ye, Mihemed Marûf kurê Mustafa kurê Ehmed Nodeyî Şarezorî yê Berzencî yê Şafî ‘î ye, û ji hêla bapîrên wî ve vedigere bapîrî wî yê sêzdehemên Seyyêd Îsa Berzencî kurê Seyyêd Baba ‘Elîyê Hemedan ku birayê Şa ‘îrê kurd yê mezin Baba Tahirê Hemedanî bû.

Ew bi navê Şêx Marûfê Nodeyê tê nasîn, ew li qezayê Şarbajêr li sala 1166 k/1753z ji dayêkbûye û li sala 1254k/1838z li Silêmaniyê wexer kiriya.

Şêx Marûfê Nodê bi xwe û bi şeweyek menzûm, di kitêbe xwe ya bi navê kome berhemên edebiyate dînî xwe dide nasîn (Nodeyî, Berhemên Edebî, 1986, R353):

(ومسقط رأسي أرض كرد وربعها وقد كان منها نشأتي ونشوتي)

Li vir ez wergere kurdî ya herdû misrayên Şx Marûf ku bi zimanê erebî ne û mamoste Dr. Ismaîl Berzencî bi spasdarî kiribû kurdî, ku tede Şêx marûf bi ron eşkereyî xudî û xudîderketin li kurd û kurdistanê dike:

(خاک و مالی کوردانه جیی له دایکی بونمه)

(همر ئەوی شوینی گەشه و دلخۆشی بوونمه)

Xwendin û perwerdeya Şêx Marûf her li destpêkê li gundê xwe bû û li ser destê bavê wî Şêx Mustafa kurê Ehmed Xezayî û Mela Mihemedê Xezayî û Mela Mihemed kurê hac hesen yê naskirî bi Ibn Alhac, herwisa jî Mela Ebdullah kurê Mihemed kurê Ismaîl kurê Îzeddînê Bêtûşî bû.

Ew nêzîkê 3 salan li gundê Nodê xwend paş demek bavê wî biribû Medreseya Xezayî li Qela Çolanê, carek vegehiya gundê Nodê û li wextek mabû, carek din berê xwe dabû Medreseya Ibn Alhac û li wir jî dîdara xwe ya yekem di Melaê Bêtûşî pêk hat, li wê Medreseyê de ew di gel Melayê bêtûşî xwendinên xwe berdewam kirin û fêrî hemû zanistên kelmê û Fiqihê û edebiyat û dest bi honandine Şi 'rê kiribû, çî bi kurdî û erebî û farsî jî (Xal, Bêtûşî, 1958, R30-31).

Şêx Marûf wek me gotî ji binemalek xudan Îlm û ayîn bûn, ew di gel zimanê dayêkî yê kurdî, herwisa jî bi zimanê Erebi û Farsî baz dizanîbû, ew kome berhemên wî ku bi zimanê erebî nîşanek başa li ser Jêhatûbûn û zîrekiya wî di zimanê Erebi de, derbarê vê mijarê em dibînin Şêx Marûf di rêya çendîn berhemên xwe vê yekê tîne ziman, (Nodeyî, alşamil lîlawamil, 1984, R12)

(بطلب العلم قد اشتغلت من الصبا إلا أن اكتهلت)

Carek din Şêx Marûf behsa perwerdeya xwe û kurê wî kak Ehmedê Şêx dike di kitêbe xwe de (Nodeyî, Berhemên Edebî, 1986, R56:


(أدعوا لنفسي ولأولادي بأن يعطينا الله سوابغ المنن)

Di berheme xwe de perwerde kurî wî û şanzîya wî bi asta ku Kak Ehmedê Şêx gehîştî tine ziman, (Nodeyî, 'Emel Alsiyaxa, 1986, R153):

(لقد خدمني ابني أحمد بكل ما شئت فنعلم الولد)

Li ev rûpele destxete dirext û dara binemala Berzencîyan û Şêx Marûf yek ji Berzencîyên herî mezine, ev destxet bi destê Şêx Marûf bi xwe ye û li binemala Seyyêd Mihemed Tahir Haşimî Soleyî li kirmanşahê parastiye, ev Seyyêd Tahirê Haşimî murîdî Şêxanên Soleyî Çirçeqla bû, herwisa jî muxlisek zor baş bû ji Şêx Heme Tahirî kurê Şêx Qadurî Qemçereşî bû, ev wêneya destxet direxte binemalê ji rûpele Kak Hêmin Omer Berzencî hatiya wergirtin.

Ev destxete li salî 1246k û wek dîyar dibêt ku li dawîya temenê Şêx Marûf bi şêweyek Şî'rî menzûm honadiya, Şêx Marûf di evî destxetê de hewlek bo nivîsandina dîroke binemalê daye ser milê xwe ku ji Seyyêd Resûlî Haşimî Soleyî destpê dike ta dawî kes û zanayên Berzencîyan weku xwe û Kak Ehmedê Şêx û nevîyên wan.



Destxete Drex û Şecereya Binemala Berzencîyan

Cihê Şêx Marûfê Nodê di Edebiyate kurdî ya klasîk û nexasma di dîroka Ferhnege Kurdî ya menzûm de.

Ev zate pîroze ku bi drêjayî temenê 86 salan ku tije Îlm û îrfan û Zimannasî û edebiyathez, herwisa jî di warên cûda ya Zanistên Islamî de, karî bû navek xwe ya berz û bi nirx li paş xwe bihêle.

Şêx Marûf wek keseyatiyek roşinbîrî taybete, ne tenê li serdema Mîrnişînê Baban û devere Şarezor û Silêmaniyê, lê belê li tevayê kurdistanê mezin û dewletên dewrûber û li cîhana islamî jî, ji ber ku ew bi paşxaneyê xwe ya dewlemend ji çande erebî û farsî, di gel ya roşinbîriya kurdî karîbû keseyatiyek taybet û cihek berz di nava edebiyate islamî ya cîhanî bigire.

Şêx marûfê Nodê yek ji wan zanayên kurd bû, ku mohre wî ya diyare di warê nivîsîn û perwerde û fêrkinê, ji ew roje ta roje îro em dibînin ku bi sedan xwendevan û feqe kurd û ereb û fars û yên milletên din jî kanîya îlm û zanîne wî vexwarin, li her warî de, ji Fiqih û Hedîs û Eqîde, Êsul Fiqih, Belaxet û nehû û ziman, tiştî ya herî seyr û balkêş bû, ku Şêx marûf hemû berhemên xwe bi şêweyek menzûm honandiya û amdakirîya, îro em dibînin berhem û eserên wî, mîrase wî di temamî kitêbxanên Îraqê û kirdistanê, bi taybetî li kitêbxanên bajare Silêmaniyê ya weqfî û ne weqfî jî cihê xwe digirin.

Bi vî şêweyî Şêx Marûf di berheme xwe ya bi navê (الأغراب) de tîne ziman ku ew çawa bi şev û roj hewildanên wî bo wergirtine Îlm û zanîne, (Nodeyî, Alaxrab/ الأغراب, 1984, R166):

(في طلب العلم أتعبت الفكر إذ أنا يافع إلى حين الكبر)

Herwisa jî Şêx Marûf di kitêbe xwe de ya bi navê (تنقيح العبارات) de, ji me re dibêje ku ew çawa û kengî dest xwendin û perwerdeyê û danana berhemên berhemên xwe yên cûda dike û ku ew di temene 17eh salî de dest pêkiribû, (Nodeyî, Tenqîh Alîbarat, 1984, R197):

(قد تم ما ألفت في الشباب من غير إيجاز ولا إطناب)

Di cihekî kitêbe xwe de ya bi navê (الشامل للعوامل) de, şêx Marûf ji me re tîne ziman ku yekem car dîdare wî di gel zanayê mezin Melayê Abdullayê Bêtûşî dike, ku çawa alûgorî xwendina qesîde û Şî'rên di huzûre Zanayê Bêtûşî dike:

„bi xuda ji ew roje han ku min ew zanaya dît, ew îlhama min bi roj bi roj firhetir û gewre tir bû ku min berhemên bê mînak ji Pexşan û menzûm honandin û nivîsandin, ji ew roje ev honandine Metnên menzûm bûye kar û pîşeyek nema dikarim dev jê berdim.“ (Nodeyî, Alşamil Lîllawamil, 1984.R153):

(ألف بالتماس عبد الله لازال فضيلة وجاه)

Kurte bas û nêrînek giştî ji Berhemên Şêx Marûfê Nodê re:

Di koma berhemên Şêx Marûf de, beşa Rêziman û Ferhengan ya herî mezin di kome berhemên wî de li wir cihê xwe girtiya, ev berhemene bi van navên jêrîn rêzdikin:

1. (الأغراب, نظم قواعد الإعراب): di evî menzûmî de Şêx Marûf karîbû di hundir 772 beytên menzûm honandiya, Şêx bi xwe jî derbarê ev menzûme di, (Nodeyî, Alaxrab, 1984, R155) wisa gotiya:

(نظمته لزمر الطلاب مسميًا إياه بالإعراب)

2. Berhema duyem ya bi navê (كفاية الطالب), ev ferhenga mezûm bi şêweya Arcûza honandiya û jî 1683 beytan pêk têt.

3. Berheme sîye, ya bi navê (الشمائل للعوامل), ev jî kitêbeke menzûm li kitêba Alcurcanî û jî 243 beytan pêk têt, Şêx di kitêba xwe de ya bi navê (Nodeyî, Alşamil Lîllawamil, 1984.R116) wisa anîya ziman:

(عوامل الجرجاني أرجوا بها الدعاء من إخواني)

4. Berheme çaran ya bi navê (فتح الرؤوف في معاني الحروف), ev ferhenge han jî 243 beytan pêk têt, Şêx di kitêba xwe de ya bi navê (Nodeyî, Fath Alraûf, 1986.R321) wisa anîya ziman:

(سميته فتح الرؤوف يجدي محصلا في طلب, ذا جد)

5. Berheme pêcemîn û ya dawî û girîng û cihê mijar û babete me ya, ew jî Ferheneg Ehmedî ya, yan weku çawa di nave gel de bi navê Luxatnama Ehmedî têtê nasîn, ev jî berheme Şêx Marûf ya tekane bi zimanê kurdî têtêkele bi şirove kirine peyv û wûşeyên erebî bi zimanê kurdî.

Şêx Marûf di evî Ferhenge xwe de ku li sala 1210k bi şêweyek menzûm honandiya û têtêda nêzîkî 1170 peyvên kurdî li berember heman hêjmar, bi 1170 peyvên erebî daye şirove kirin, lê Şêx Mihemdê Xal di kitêbe xwe de ya bi navê (Xal, 1961, R98) dibêje:

„ Ferhenga Ehmedî jî 1475 peyvên kurdî li bermeberî yên erebî li sala 1210 yê koçî û di hondir 368 beytan de honandiya, û li ser dû beşan parvekiriya, yek beşê navan û ya duyem beşê Lêkeran, di gel pêşgotinek bi zimanê farsî “

Ferhenge Ehmedî di dîroka Edebiyate kurdî ya klasîk de û bi taybetî di dîroka Ferhengên kurdî yên ku bi şêweyek menzûn hatine honandin, ev ferheng weku dûyemîn girînrîn ferhenge kurdî ya.

Ferhengên kurdî di serdema Medreseyên kurdî li serenserî kurdistanê yek jî 12 Îlm û zanistên girîng û pêşîn ku divê Feqeyên kurd di hucreya Mederseyan de buxwûnin û fêrbibin, bi rêya wan ferhengan Şagrit û Feqeyan dikarin bi hêsanî Quranê bixwûnin û naveroke Sûret û Ayatên Quranê têbighêjin.

Lew re jî ev berheme ya Şêx Marûf ya herî ber bi çav û balkêş bu, ji ber ku bi zimanê kurdî bû, û take berheme ji koma berhemên wî di warê zimannasî û ferhengî de, lew re jî Şêx Marûfê Nodê bi Ehmedî ya xwe û Ehmedê Xanî bi Nûbihare Biçûkan ve, herdû ev zatên pîroz danerên binyate perwerdeya sîstematîk ya ku îro bi navê Pedagogy têtê nasîn, wate Sîstema Perwerdeya Zarokan ya nûjen,

Şêx Marûfê Nodê Danerê Ferhenga Lu'xatnama Ehmedî, Hekar û sedemên honadine Ferhengê.

Ev ferhenge menzûm cara yekem li sala 1210k bi destxetê Şêx Marûf bi xwe bû, wek di pêşgotine Ehmedîyê de diyare bo çî û bo kê honandiya, Şêx Mihmedê Xal di kitêbe xwe derbarê sedema honandin û danana Ehmedî (Xal, 1961, R98 & 99) wisa tîne ziman:

(Menzûmeke di sala 1210k-1795z bo kurê xwe Ehmed ku di temenê sê salan de bû honadiya, da ku Ehmed karibe wan peyv û wûşeyên zimanê erebî yên ku di hucreyên Mederseyan têne gotin û bilêvkin, Şêx karîbû 1475 peyv û wûşeyên erebî beremberî wan bi kurdî şirove kiriya, lew re jê navê Ehmedîya lê kiriya, Ehmedî ji 368 beytan pêk têt û li ser dû beşên cûda dabeşkiriya, beşa yekem yê Navan û beşa duyem yê Lêkeran ye, di gel pêşgotinek menzûm û bi zimanê farsî dest bi honandina Ferhenge xwe kiriya).

Şêxê Xal dûbare dike û dibêje: (ev Ferhenge menzûm dibe alîkar be, çî bo kurdek yan Erebekek ku karibe bi hêsani fêrê herdû zimanên Kurdî û Erebi û herweha perwerdeya wan bi zimanê kurdî û Erebi hêsantir dibe)

پروردگار مُلک و ملکوت	“ به نام خدای حَى لا یَموت
الْحَمْدُ لِلَّهِ عَلَى مَا وَهَبَ	هَدَانَا إِلَى لِسَانِ الْعَرَبِ
صلاة و سلام بی حد و حساب	بر محمد باد هم آل و اصحاب
معروف بن مصطفى بن احمد	و بعد بدان چنین میگوید
وَ أَبَوَيْهِ كَأَسْلَافِهِ	قَدْ حَقَّهُ اللَّهُ بِالْطَّافِهِ
کنم زبان عرب را بیان	در این رساله به کردی زبان
شود دانای لغات عَرَبِ	تا که فرزندم احمد بی تعب
و الله أَرْجُو إِصْلَاحَ النَّيَّةِ	(أحمدیه) لهذا ناوم نا
یک باب اسماء، یک باب افعال	به دو باب کتاب می شود کمال
جمعش یک بود یا دو یا کثیر	زیر هر اسمی می کنم تحریر
فعل ماضی را کنم ترجمه	در باب افعال میان همه
مضارع و مصدر کم بی یا کثیر	زیر هر فعلی می کنم تقریر
وَ انْفَعُ بِهَا الطَّالِبُ الْمُتَبَدِّي	رَبِّ وَ قَفْنِي وَ خُذْ بِيَدِي

Ferhengên menzûm amrazên û şêwazên perwerdeyê û fêrbûnê ne, ne xasma ji bo zarokan rêbazeke nûjene û herwiha ji bo jiberkirinê jî rêbazeke kevnare û giranbiha ye. Çawa ku di „erebî, tirkî û farisî de, tiradîsyona ferhengên menzûm di edebiyata klasîk de çiyekî taybet heye, wisa jî di edebiyata kurdî de jî ev kevneşopî rengê xwerû û cihê daye edebiyata kurdî ya klasîk.

Di edebiyata Kurdî ya Klasîk de gelek çeşn û cûreyên menzûm hene, (Bolelî & Ertekîn, 2017, R21).

Di nav wan cûreyan de ferhengên menzûm jî ciyekî taybet û girîng digirin. Weke ku têtê zanîn edebiyata klasîk li ser bingeha wezn û qafiyeyê hatiye avakirin, her wisa jî Ferhengên kurdî yên menzûm jî wisa li gorî evî babetê hewl dane ku vê kevneşopiyê bişopînin, wate ferhengên kurdî yên menzûm li ser binyata wezn û Qafîya ya di Erûze erebî de. Xuyeya van berheman rêbazêke perwerdeyê ye ku ji berkirinê Peyvan û hevokan hêsantir dike û ji bo zarokan fêrbûn û hînbûn bi teşwîqek balkêş pêşde bibe.

Di dîroka ferhengên kurdî yên menzûm de ta niha heşt ferhengên menzûm hatine tesbîtkirin. Ji heyştan, heft tenê ji wan hatine çapkirin, yek nehatiye çapkirin.

Ya heyştan ku ta berî demekî nehatibû çapkirin Ferhenga Mela Mehmûdê Tîruwayî ku navê wê Ferhenge Quranê ye, ev jî xebat û teza masterê ya (Seyfettin AYKAÇ, Zanîngeha Bingöl, 2016).

Carek din jî û li sala 2019an de, li gor lêkolînek ku di Kovara Zanîngeha Bingölê hate belavkirin (Nurettin Ertekin, Zanîngeha Bingöl, sala 2019, R23). Di evî gotarê de, têtê diyarkirin ku çapên nû yên ferhengên menzûm derketin hole û hêjmara ferhengan ji 8an de bilind bû û gehîşt 12 ferhengên menzûm bi tevayî.

Dîrok û mêjuya ferhengên menzûm li gor rêza dîrokê û demê em dikarin bi ev dabeşkirina dîrokî parve bikin:

- 1- Yekemîn ferhenga kurdî ya menzûm di sedsala XVIIan de ji aliyê Ehmedê Xanî ve hatiye honandin û nivîsîn, bi zimanê Erebi û Kurdî ya, navê wê Nûbehara Biçûkan e, ew di sala 1683an de amadakiriya.
- 2- Duyemîn ferhenga menzûm bi sê zimanên Erebi û Farsî û Kurdî ya, ya Mela Îsmailê Bazîdî ye û navê wê Gulzar e, ew di navbere salên 1655-1710an de, wate di sedsala 18an de amadakiriya.
- 3- Sêyemîn ferheng bi zimanê Erebi û Kurdî ya, ya Şêx Marûfê Nodeyî ye û navê wê Ehmedî ye, ew di sala 1210k de amadakiriya.
- 4- Çaremîn ferheng bi zimanê Kurdî û Farsî ya, ya Şêx Mihemed Kerbelayî ye û navê wê Mîrsad'ul Etfal e, ew di sala 1912an de amadakiriya.
- 5- Pêncemîn ferheng bi zimanê Erebi û Kurdî ya, ya zanayê mezin Mela 'Ebdulkerîm Muderris a û navê wê Duruşteyê Mirrwarî ye, ew di sala 1970 de amadakiriya.
- 6- Şeşemîn ferheng bi zimanê Tirkî û Kurdî ya, ya Dilbikulê Cizîrî ye û navê wê Nûbihara Mezinan e, ew di sala 2015an de amadakiriya.
- 7- Heftemîn ferheng bi zimanê Erebi û Kurdî ya, ya 'Ebdulsettar Rêkanî ye û navê wê Nûbehara Mizgefta Sîriyê ye, ew di sala 2014 de amadakiriya.
- 8- Heştamîn Ferheng bi zimanê Kurdî û Înglîzî ye, ya 'Ebdulssettara Rêkanî ye û navê wê mixabin ne diyare (Bolelî & Ertekî, 2017, R26).

9- Nehemîn Ferheng bi kurdî û Tirkîye, Kitabu'l-luxetî't-Turkîyyewe'l-Kurdîyye, ya Mela 'Ebdullahê Kotalîyê (Bolelî & Ertekîn, 2017, R26).

10- Dehemîn Ferheng û ji 3 Ferhengan pêk tên, Kurdî-Azerî, Azerî- Kurd, Ferhenga Mişarên Zimanê Kurdî, ya Şamîl Esgerov, 1999 (Bolelî & Ertekîn, 2017, R26).

11- Yazdemîn Ferheng bi Kurdî (Zazakî) û Erebi ya, ya Abdulezîz Bekî, (Bolelî & Ertekîn, 2017, R26).

12- Duwanzdemîn ferheng xwerû bi zimanê Kurdî ya, ya Mela Mehmed Tîruwayî ye û navê wê Ferhenga Quranê ye û di sala 2000 de amadakiriya.

Hêjayê gotinê ye ku çendîn Ferhengên kurdî hene di warê Rêzimana kurdî de û divê em wan paşguh nekin:

- 1- Ferhenge Rêzimana Erebi bi zimanê kurdî ya Mela Elîyê Termaxî, ya ku li sala 1591-1592 amada kiribû.
- 2- Ferhenga Mela Mahmûdê Bazîdî ya bi navê Tuhfetul-xullan fî zimanê Kurdan ku li sala 1866 li ser daxwaza Konsolosê Rûsya li bajarê Erzurûmê Alexander Jaba amada kiribû.
- 3- Ferhenga rêzimana kurdî ya bi navê Luxatî Kurdî ya Ebu Alhasan Ardelanî, ku li sala 1888an de li ser daxwaza Şahê Îranê Muzafardîn Şah amada kiribû.

Gringî û taybetmendiyên Ferhengên Menzûm di ziman de ya, di kevneşopiya ziman de gelek agahî û zanayari bi şeweyek menzûm hatiye çekirin ku ev agahî payidar be, ji Rêziman bigre, Belaxet, t Tefsîr û Şerh û şirovekirin, her weha di zanistên Islamî yên din de hema bêje di hemiyan de ew rêbaz bikar anîne, ev rêbaz di dema wan feqiyên Medrese û Hucreyan ku teze dest bi xwendinê kirine divê ku peyvên û rêzimana wî zimanî bizanin, bi evî şeweyî baş û dirust Fêr û hîn dibûn û jiberdikirin, di dema xwendinê de rîtm û awazek musîkê diafrîne û zor caran bi kêfxweşî û zewq dubare dikirin û li ser zimanên wan bi hêsanî diherike, di gel wê çand, edebiyat û derheqê arûzêde agahdar dibûn. Ev suxteyên ku meyla van li aliyê helbestvanîyê ve heye ev agahiya hunerên edebî, erûz, behr û wezn bi wan dida hînkirin. Ji bo hînkirinê ew peyvên ku têkilîyên wan bi hev re heye an jî ew peyvên ku dijî hev in di yek malikê de bi hev re tê xebitandin.

Digel wezn û Qafiyê û Sirwe peyvên bi cînas jî di malik û rêzikan de tê xebitandin ku hînbûn bi zewq hêsan be, di berhemê de dema ku hevok ji bo hînkirinê tene sazûmankirin peyvên ku meşhûr û herkes dizane tê bikiranîn (Seyfettin AYKAÇ, Zanîngeha Bingöl, 2016, R6).

Di piranî û zorbeyên ferhengên menzûm de bi kakilê nezma mesnewî, wate dûbeytî hatiye honandin û nivîsandin û bi evî rêzê dest bi honandine Ferhengê dikan:

- 1- Destpêk bi besmelê, hemdelê û selwelê û Selawatan ... htd.
- 2- Danerê ferhengê têt bo me sedem û hokarên danan û çêkirina wan ferhengan şirove dike.
- 3- Daner hêdî-hêdî û bi kurte Kurt behsa Pêxember dike û di derheqe wî de hin agahî û zanyarî dide, her wisa behsa Sehabîyan, Îmaman û ... htd
- 4- Daner li dawî ya Ferhenga xwe bi dû 'yan û paraneyan berheme xwe kuta dike.

Ev kevneşopî û tradîsyna di her Ferhengê klasîk û menzûm de derbas dibe, emê ev kevneşopî di Ferhengên herdû nemiran de, Ehmedê Xanî û Marûfê Nodê, di Ehmedî û Nûbehara Biçûkan de bibînin.

Luxatnama Ehmedî ya Şêx Marûfê Nodê û Nûbihara Biçûkan ya Ehmedê Xanî, berewirdeyek biçûk di gel çendîn laperên cûda ji destnivîsên herdû Zanayên gewre Xanî û Nodê

Wek me li jor anî bû ziman ku çendîn Ferhengên menzûm di Edebiyate kurdî ya klasîk de hene û van ferhengan çî roll leystine di sistema Perwerde û Fêrkirine Şagirt û Feqeyan di Hucre û Medreseyan kurdî de, lê di ev gotare me de, emê bi taybetî li ser dû ferhengên girîng di dîroka Wêjeya kurdî ya klasîk de rawestin, Ehmedî û Nûbehar Biçûkan

Nûbehara Biçûkan

Berhema Şêx Ehmedê Xanî ji Dîbaca û metn û kutahîyek pêktêt, herwisa ji 13eh beşên menzûm pêktê, tevayî beş û perçeyên menzûm ji 219 beytên bi Şî'rên menzûm (Bolelî & Ertekîn, 2017, R26), hatiya honandin.

Navê Berheme Ferhenga Şêx Ehmed Xanî:

Şêx Ehmedê Xanî yekser di pêşgotinê û di dîbacê de navê Ferhenge xwe tîne ziman di hundurê berhemê de û di beşa yekem.

Vêk êxistin Ehmedê Xanî

Navê Nûbihara Biçûkan lê danî

Hokar û sedema Honadina Ferhenga Xanî:

Yek ji taybetmendiyan ferhenge Şêx Ehmedê Xanî ku ev berhem bo tevayî Zarokên kurdan honandiya, ev jî ciwazîyeke ji Ehmedî ya Şêx Marûf ku tede amja kiribû bo kurê xwe Ehmed honandiya.

Şêx Ehmedê Xanî di destpêka Ferhengê de û di beyta 7 an de sedema nivîsandina Nûbihara Biçûkan tîne ziman ku ev behrem ji bo zarokên kurmanca hatiye amadekirin.

Ne ji bo sahip rewacan

Belkî ji bo biçûkê kurmancan

Teşeya Nezme Nûbeharê û Erûze Erebi:

Ferhenga Nûbeharê bi teşeye Menzûm û Mesnewî, wate dúbeytî hatiya honandin, ji hêla bikaranîne kêşe û Sirweyan, anku erûze erebî, Seydayê Xanî hatiya heft kakilên Erûze Erebi di Nûbeharê de bakarînaya, ev jî ev in (Hezec, Recez, Remel, Mûdari', Besît, Serî' û Mûteqarib).

Xweş tu vê behrê bixwûne lew ku xweş çûne

Fa'îlatun, Fa'îlatun, Fa'îlatun, Fa'îlat

Remel

Meqtûlî kuştî, mexsûlî şîştî

Mustef'îlun, Mustef'îlun, Mustef'îlun, Mustef'îlun

Recez

Di gotara Kovara Zankoya Bîngolê (Bolelî & Ertekîn, 2017, R26), herdû berêzan dibljin: (Eger ev herdû beyt jî bên jimartin hejmara beytên berhemê dibe 217e, bi tevahî 852 bêjeyên Kurdî û 1317 bêjeyên 'Erebî, bi giştî 2169 bêje di berhemêde bi cîh bûne.)

Ji ber ku di destxete û Kitêba Gulzara Hemûkan Şerha Nûbihara Biçûkan ya Seydayê Koxî de (Qoxî. Ehmed Hilmi, 2004, R19), koxî dibêje ev beytên jêrîn gûman li ser heye û ew dibêje ku Ehmedê Xanî mirovek peyrewê mezhebe Sunîti/ Şafî 'yî ya û bawer naka ku Xanî ev dî beytên li gor peyrewê Şî 'îtî û dawayê Şî 'egerî û ev jî dûrî bîr baweriya Şêx Ehmedê Xanî, lewre divê ji metne sereke bêne derxistin, yanî dive tamamî beytan bi 215 beyt bin nek 217eh betan bin???

'Elî çar in Hesên du Mûhemmed sê ne ey can

Imamê dî Huseyn e di gel Mûsa û Ce'fer

Ev in bil cumle bê şek bizan qencê îmaman

Ji bo me çarî dîtir heyin sahip mezahip

Ehmedî yan Luxatnama Ehmedî

Ferhenga Şêx Marûf Nodê weku dûyemîn ji girîngtrîn ferhengên kurdî ne, ew nêzîkî 100 sala paş yê Xanî amad kiribû, ev ferhenga 3ê sal paş jidayêkbûne Kak Ehmedê Şêx ku li sala 1207/1798 bû.

Ferhenga Şêxê Nodê ji Dîbaca û 13 beşên bi şêweye mesnewî honandiya, di dîbaca û pêşgotine xwe de ku ji 11 leh beytan bi zimanê farsî bûn û tenha 2 beytên bi zimanê erebî bûn.

Metnê Ferhengê li ser dû beşan dabeşkiribû, yek ji bo Navan û ya duyem ji bo Lêkeran.

Bi dû bab kîtab mî şewed kemal
Yek babê esma û yek babê ef ‘âl

Navê Ferhenga Şêx Marûf Nodê:

Şêx Marûf Nodê weku tradisyona Danerên Ferhengên klasîk yên menzûm, navê ferhenga xwe di destpêka metnê û de di beyta 8an de tine ziman û wisa binav dike.

Lî haza nawem na ‘Ehmediye’
Wellahe ercû islahi’n-niyye

Hokar û sedema Honadina Ferhenga Nodê:

Wek me li jor jî anî bû ziman, ku ferhenga Şêxê Nodê wek ew bi xwe di metnê amja kiribû, ku ev ferheng bo kurê wî Ehmed bû, wate taybete bo Kak Ehmedê Şêx, Şêxê Nodê ji ber hokar û sedemên honandina vê berhemê di dîbaca Ferhengê de û di beyta 7 an de kifş û zelal anîya ziman

Der eyn risale be kurdî ziban
Mikunim ziban erbî ra beyan
Ta kî ferzendem Ehmed bê te’eb
Şewed danayê luxatê ‘ereb

Teşeya Nezme Ehmedî û Erûze Erebi:

Ferhenga Ehmedî ya Şêx Marûf ji serî de ta dawî de bi teşeye Mesnewî, wate dûbeytî hatiya honandin, ji hêla bikaranîne kêşe û Sirweyan, anku erûze erebî, Şêxê Nodê hatiya 3 kakilên Erûze Erebi bi karanîya (Remel, Serî ‘, Munserih, Mûtaqrîbî Meqsur).

Di gel wê jî em dibînin, ku Şêx Marûf di beşên cûda yê Ehmedî Erûz û kêşeye kurdî ya xomalî bi karîna, ev jî di Edebiyate kurdî ya klasîk de bi Birgeyên xomalî têtê nasîn, di Ehmedî de 8 birge, 10 birge hatin bi karanîn.

رأس: سمره. عَيْن: چاوه

بَدَن: قالب اسم: ناوه

Re ‘s: sere, ‘eyn: çawe

beden: qalb, isim: nawe

ev beyte li ser erûzî kurdî ya 8 Birgeyan hatiya avakirin û nêzikî kêşî Hezecî erebî ya.

Carek din Şêx Marûf di Ehmedî de, erûze kurdî ya 10 Birgeyan bi karanîya.

مُقْلَة: گَلِنِه, طَرْف و بَصَر: چاوه

عَمَامَة: مِيز مر, تاقِيَة: كَلَاوه

قَبَاء: كهوايه, قَمِيص: كراسه

سَرَاوِيل: دهرپێ, مَسَح: په لاسه

muqle: gilêne, terf û beser: çawe

'emame: mêzer, taqî: kilawe

qeba': kewaye, qemîs: kirase

serawîl: derpê, mîsih: pelase

li ev beyta ya jêrîn carek Şêx Ehmed vegerîya bi karanîne kêş û erûze erebî, mînak di evî beytî de Behre Remel yê Mehzuf.

(هرم): پیری, (شيب): مووی سفید

(رجاء, أمل هم أمل): ئومید

Hîrem: pîrî. şîb: mûyî sifîd

Rica, emel hem emel: Omîd

فاعلاتن- فاعلاتن- فاعلاتن- فاعلن

Herwisa jî Şêx Marûf di Ehmedî û di beşa navan de, cureyek dîtir ji erûze erebî bi kanînaya, ew jî bi navê behre Serî (البحر السريع), wek ev nimûneya jêrîn

أيل: بزنه کيوی نیر, صَوْت: دهنگ

ثُوت: تووه, شَيْمَة: خووه, لَوْن: رهنگ

ayil: bizne kêwî nêr; sewt: deng

tût: tuwe, şeyme: xuwe, lewn: reng

مستفعلن- مستفعلن- فاعلن

Dîrok û Mêjûye honandina herdû ferhengan, Nûbehar û Ehmedî:

Mixabin Şêx Marûf di Ehmedî de, bi hîç şêweyek dîroka honandina Ehmedî diyar nekiriye, an jî Şêx Marûf hîç ew tradîsiyona hesabê ebcedê bi kar ne anîya.

Lê Şêx Ehmedî Xanî di dawîya Ferhenga xwe ev yek bi eşkerayî diyar kiriya

Evrengehe dibêjit Xanî: Eger tu bîfzanî
 Bifikire li kitêba sanî di cildê ewwel da
 Ji cuz'ê aşir di wereqa çarê da
 Ji sehîfa destê rastê, di setra salis da
 Ji kelîma sanî bigre tu herfa çarê
 Ew e tarîxa Nûbeharê

Li gorî vê hesabê Ebcedî, dîroka bi dawîbûne honandina Nûbeharê, 14ê (ربيع الأول) sala 1094an yê koçîe beramberî 1683an yê zayînî tê.

Serancam û Xalên giştî ya gotarê:

Wek hemû edebiyatên milletên rojhilatanavîn, di amadekirina ferhengê menzûm, edebiyata Kurdî jî ji vê cûreyê edebî xwe bê par nehiştiye û weku me li jor anîbû ziman wêjeya kurdî bi 12 berhemên xwe yên giranbuha nîşan daye.

Çawa ku mînakê wan di edebiyata milletên rojhilatanavîn tînin ferhengê du zimanî û sê zimanî jî hatine nivîsandin, Ji bo hersê çandên ku zêde têkilî û peywendî bi wan re hatiye avakirin, ku ew jî; 'Ereb û Fars û Tirk in, ferheng ji bi zimanê wan hatine honandin, dema ku em bala xwe didin sedem û egerên nivîsandin û honandine wan, em dibînin ku piranî yan ji bo zarokên kurdan, yan ji bo kur û neviyên xwe yan jî ji bo xwendevanên xwe hatine danan.


Nûbihara Biçûkan û Luxatnama Ehmedî dû ferhengê tekûz in ku li gor rêbazên û pîvanên ferhengên menzûm yên edebiyata rojhilatanavîn hatine nivîsandin:

- 1- Şêx Marûfê Nodê, ne tenê kesekî rêberê terîqetê û Ayînzana, lê belê mirovekî rewşenbîr û ronakbîr di hemî warên Zanistê kelam, rewanbêjî û wêje, di Pexşan û helbestê de, ew bi dehan berhemên cûda çî bi zimanê kurdî û farsî û erebî di qada Edebiyata kurdî ya klasîd dabû çespendin, îro berhemên wî di her war û mijarê de, bûne chiê twêjandin û lêkolîn, herwisa jî xebatên Master û Doktorayê.
- 2- Şêx Marûfê Nodê, di dîroka edebiyata kurdî de û nexasma di Tarîxa ferhengên menzûm xudan taka berhemek kurdî ya, ew jî Ehmedî ya
- 3- Şêx Marûfê Nodê ferhenga xwe Ehmedî (1795z) amada kiribû piştî nêzikî 100 salan ku Şêx Ehmedê Xanî Nûbehara Biçûkan (1683z) amada kiribû.
- 4- Di edebiyata Kurdî de, herdû ferhengan Ehmedî û Nûbehar ji menzûmên yekemîn û sereke ne, lê bi zaravên cûda yê zimanê kurdî yên sereke ne.
- 5- Di mêjuya edebiyata Kurdî de û di dîroka ferhenga kurdî ya menzûm ya Nûbehar ya yekeme û Ehmedî ya duyeme.
- 6- Di edebiyata Kurdî de ferhenga Ehmedî, ferhenga du zimanî Erebi û Kurdî a yekeme bi zaravê kurdîya navendî ya.
- 7- Di edebiyata Kurdî de di warê mijara 'erûze erebî de, Nûbehar berhema yekeme, herwisa jî Ehmedî di warê babete 'erûze erebî û 'erûze xomalî ya kurdî ya yekeme.
- 8- Di edebiyata Kurdî de ji bo perwerdehiya zarokan û ji perwerdehiya zimanê zikmakî, herdû ferhengên yekemîn in.

- 9- Taka cûdahî di navbera herdû ferhengan de armanc û egere danîne ye, Şêx Marûf ferhenge Ehmedî tenê bo kurê xwe Ehmed wek ew bi xwe di pêşgotine xwe de dabû amanc kirin, taku Kaka Ehmedê Şêx di fêrbûn û perwerdeyê de hîç zehmetî nebîne, lê di Nûbehara ya Şêx Ehmedê Xanî ne wisa bû, Xanî gotibû ew Nûbehar danî bû bo temamî zarokên kurdan.
- 10- Herdû nemirên gewre, Xanî û Nodê bi dahînanên xwe ve, hîm û binyat, berdî binaxayî zaniste perwerdeya zarokan, wek çawa bi Inglîzî dibêjin (children educational & pedagogical) pêkve danana.

Berewirdkirina destnivîse Luxatnama Ehmedî û Nûbihara Biçûkan

(Nimûne û Pêvek)




Pêvek: 1

Destxete Nûbehara Biçûkan

Navnîşan û Dîbaca


Dane û Nûsxeya Kevin



Pêvek: 2

Destxete Nûbehara Biçûkan

Rûpela dawî û kutahiya Nûbeharê



Pêvek: 3

Destxete Nûbehara Biçûkan

Kitêbxana Berlînê

Navnîşan û Dîbaca




Pêvek: 4

Destxete Nûbehara Biçûkan

Kitêbxanên Tirkiyê

Navnîşan û Dîbaca



Pêvek: 5

Destxete Nûbehara Biçûkan

Kitêbxana Berlîne

Navnîşan û Dîbaca

بسم الله الرحمن الرحيم **بسم الله الرحمن الرحيم**
 بنام خدای حق لایوت پروردگار ملک ملکوت
 الحمد لله على ما وهب هدایا إلى المشاء العرب
 صلواته على صد صبا بر محمد باد هم آل اصحاب
 وبعد بن خنبر مکتوبه معدنی بن مصطفی بن احمد
 قد حقه الله باطرافه وابویه کاسلا فده
 درین رساله بکرم زبان مکتبم زبان عربی بیان
 تا که فرزندان احمد بقیع شود دانشمند لغت عرب
 لهذا و مناهدیده والله ارجو اصلاح لکینه
 بدو باب کتاب میشود کمال یک باب استایل باب فعال
 زیر هر اسمی میکنم تحریر جمعش یک بود یاد و یاد کنیز
 در باب افعال میان همه فعل ماضی کنم ترجمه
 زیر هر فعلی میکنم تحریر مضارع مصدر کم ی یا کنیز
 رب و فتی و خذیدی و انفع بها الطالب المبتدئ
باب الاول في ترجمة الاسماء قطع در مقام قصه
 بدن قایل اسم نافع ریس سر عین چاق
 خذرائه رکیبه اثر نافع لوتی حاجب برو
 مکرید حیلہ فیله جبین جبهت تویله
 کعب ککرون نفاع یونکه بطن سکه صدر سکه
 شفه لیون سن دلانه ظهر پشتی کتف شانہ
 لین شیره لین خشته سین یام متن پشته
 قرناء شاخدار جم کوله ساعد با سکه عقد قوله
 عدس نیکه حص نکه شمر مو قطن لک
 صافی صافه کیده طفرینت مسحات بیلہ
 جرم برینه و جم الیته شارب سیمیل حیدہ رایسته
 سراج چسپان بطی سته باع دراج ید دستہ

در این رساله بکرم زبان مکتبم زبان عربی بیان
 تا که فرزندان احمد بقیع شود دانشمند لغت عرب
 لهذا و مناهدیده والله ارجو اصلاح لکینه
 بدو باب کتاب میشود کمال یک باب استایل باب فعال
 زیر هر اسمی میکنم تحریر جمعش یک بود یاد و یاد کنیز
 در باب افعال میان همه فعل ماضی کنم ترجمه
 زیر هر فعلی میکنم تحریر مضارع مصدر کم ی یا کنیز

Pêvek: 1


Destxete Ehmedî- Binkey Jîn

Navnîşan û Dîbaca

Destxetî nû û Taza û hêşte ne belavkirî, bi navê

Nîsabul Ehmedî (نصابُ الأحمدي)

(Nimûne û Pêvek)




Pêvek: 1

Destxete Nû ya bi navê Nîsaba Ehmedî

Kitêbxana Meclîsê Îranê

Navnîşan û Dîbaca



Pêvek: 2

Destxete Nû ya bi navê Nîsab Ehmedî

Kitêbxana Meclîsê Îranê

Rûpela dawî û kutahiya Nîsaba Ehmedî

Çavkanî û Serçawakanên Kurdî:

- 1- Destnivîse Ehmedê Xanî, Nûbehare Biçûkan, Kitêbxana Berlîn.
- 2- Destnivîse Şêx Marûf Nodê, Ehmedî, Binkey Jîn.
- 3- Destnivîse Nîsab Ehmedî, Mihemed kurê Ebdullah, Kitêbxana Meclîs.
- 4- Gulzara Hemûkan Şerha Nûbihara Biçûkan, Qoxî. Ehmed Hilmi, 2004.
- 5- Mela Mehmûdê Tîruwayî û Ferhenga Wî Ya Menzûm, Aykaç, Seyfettin, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Bîngolê, 2016.
- 6- Kurtenêrînek li ser Nûbehara Biçûkan, Nurettin ERTEKÎN, Kovara Zankoya Bîngolê, 2019.
- 7- Ferhengên Menzûm di Edebîyata Kurdî de, Nusrettin BOLELLÎ & Nurettin ERTEKÎN, Kovara Zankoya Bîngolê, 2017.

المصادر والمراجع باللغة العربية:

- 1- في رحاب أقلام وشخصيات كُردية, محمد علي القرمداغى, 2007
- 2- بابان في التاريخ و مشاهير البابانين, جمال بابان, 1993
- 3- الشيخ معروف النودهى البرزنجي, محمد الخال, 1961
- 4- الإعلام, خير الدين بن محمود الزركلي, 2002
- 5- الشامل للعوامل, محمد معروف النودهى, 1984
- 6- المجموعة الادبية الدينية, محمد معروف النودهى, 1986
- 7- عمل الصياغة, محمد معروف النودهى, 1986
- 8- فتح الرؤوف في معاني الحروف, محمد معروف النودهى, 1986
- 9- تنقيح العبارات في توضيح الاستعارات, محمد معروف النودهى, 1984
- 10- الإغراب نظم قواعد الإعراب, محمد معروف النودهى, 1984
- 11- البيتوشي, محمد الخال, 1958.